Bê dirave

# MIZGÎN

**1 - Adar - 2026** Hejmara - 202



# Naverok


1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn



Kovara Mazgîn

Kovara Mazgîn

**Amadekirina Naverokê**
**Amir Ferso**

**Şêwekar**
**Umer Ishaq**
**Xalid Bîco**
**Rojhilat**


**Dîzayn**
**Mecid Alsadûn**

**Sererastkirina Kurdî**
**Mihemed Xanim**
**Sererastkirina Erebî**
**Abdulah Rehîl**

# Kulîlikê wekî wêneya li jêr reng bike

لوِّنْ الزَّهرةَ كما في الرَّسمِ المُرفقِ.








# DAYÎKA DILOVAN

Wa dayîka dilovan
Xwoşewîsta mirovan

Ey dilsoza xeberxweş
Ez heyrana çavê reş

Pir şîrîn û ciwanî
Bo min ruh û rewanî

Dilnazik û evînî
Her dem tu xemrevînî

Gelek te ez mijandim
Di landika hejandim

Bo min rondik rijandin
Dil û gurçik pijandin

Bi helbest û bi lorî
Te tim digot ez gorî

Dema tê min dengê te
Tê ber çava rengê te

Rû geş dibin ji xweşî
Gul ji dêman diweşî

Tu car ji bîr nakim ez
Heta ku pîr bibim ez

Şîrê te ey dayê can
Nebînî tu êş jan



**Diyar Bohtî**

**Hejmarên guncav bixin nava valahiyên kesk; Ji bo ku hûn di valahiyên zer de encama rast bidest bixin.**

**ضعِ الأرقامَ المناسبةَ في المربَّعِ الأخضرِ؛**
**لتحصلَ على النتيجةِ الصَّحيحةِ في المربَّعِ الأصفرِ.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | = | 5 | - | 8 |
| + | | - | | + |
| 2 | = | | + | |
| = | | = | | = |
| | = | 5 | - | 10 |





# Çemê Firatê

## نهرُ الفراتِ

**Çemê Firatê rêwîtiya xwe ji Bakurê Kurdistanê dest pê dike, ew yek ji çemên herî kevin û navdar ên cîhanê ye. Ew di Rojava û Başûrê Kurdistanê re derbas dibe, dûv re digihêje Iraqê, li wir ew bi Çemê Dîclê re dibe yek û Şett El-Ereb çêdikin, paşê diherkin nav kendavê.**


يبدأُ نهرُ الفراتِ رحلتَه من باكورَ كردستانَ، وهُوَ من أقدمِ وأشهرِ الأنهارِ في العالمِ، ويمرّ في روج آفا وباشور كردستان، فيصلُ العراقَ، فيلتقي نهرَ دجلةَ؛ ليشكّلا معا شطَّ العربِ، قبل أنْ يصبّا في الخليج.

### Girîngiya Çemê Firatê

**Ew zeviyên berfireh av dide, wan ji bo çandiniyê guncaw dike. Cureyên cûrbecûr yên masiyan tê de hene û ji bo gelek cureyên firindeyan jî bûye war. Di demên kevnar de şaristaniyên girîng bi bajar û gundan li dora wê hatine avakirin.**

### أهميَّةُ نهرِ الفُراتِ

يسقي أراضي واسعةً فيجعلُها خِصبةً للزِّراعةِ، وفيهِ أسماكُ متنوِّعةٌ، وموطنٌ للعديدِ منْ أنواعِ الطُّيُورِ، وأُقِيمت حولَه قديمًا حضاراتٌ هامَّةٌ فيها المدنُ والقُرَى.




**Fîl dema ku di neynikê de li xwe binêre, dikare xwe nas bike. Ev tekeziya jîrbûna wî ya mezin di nav lawiran de ye!**

**أنَّ الفيلَ يمكنُه التَّعرُّفَ على نفسِه في المرآةِ؟ وهذا دليلُ ذكائِهِ الكبيرِ بينَ الحَيَوانَاتِ!**

# Tu dizanî

## هلْ تعلَم



**Kîvroşk bêyî ku serê xwe bizîvirîne dikare tiştên li paş xwe bibîne. Ji ber ku çavên wê di kêleka serê wê de ne!**

**أنَّ الأرنبَ يَستطيعُ رُؤيةَ ما وراءَه دُونَ أنْ يُديرَ رأسَه؟ لأنَّ عَينَيهِ تَقعانِ على جانبَيْ رأسِهِ!**

# Agahiyên tenduristiyê ji bo hevalên me yên piçûk

# مَعلومةٌ صِحِّيَّةٌ لأصدقائِنا الصِّغارِ



Hevalên min ên hêja, di zivistana dijwar de, nexweşiyên demsalî yên wekî zekemê pir in. Ji bo ku hûn li hember nexweşiyan û sedemên wanxwe biparêzin, Mizgîn çend serîştan li we dike:

- Cilên germ li xwe bikin, bi taybetî di sibeh û êvarê de.
- Piştî serşûştinê serê we şil be dernekevin.



أصدقائِي الصِّغارَ في الشِّتاءِ القارسِ، تكثُرُ الأمراضُ الموسميَّةُ مثل، الأنفلونزا وغيرُها؛ فحتَّى نقاومُ الأمراضَ ومسبباتِها؛ فإليكمُ هذهِ النَّصائحَ من مزكين:

ـ ارتَدُوا ملابسَ دافئةً، خاصَّةً في الصَّباحِ والمَساءِ.

ـ لا تخرُجُوا منَ الاستحمامِ مبلّلي الرَّأسِ.




**Pir porteqal û lîmonan bixwin, ji ber ku ew vîtamîna D dihewînin. Ew laş û hestiyan xurt dike û enerjiya ji bo lîstin û xwendinê zêde dike.**

تناوَلُوا كثيرًا من البُرتقالِ والّليمُونِ، لاحتوائهما على فيتامين" د".
فهُوَ يقوِّي الجِسمَ والعِظامَ.
ويزيدُ النَّشاطَ لِلَّعبِ والدِّراسَةِ.

# Tîp û gotin

## حُرُوفٌ وكَلماتٌ

**Hevalên hêja, tîpên kêm temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.**



# Helbestvanê Kurd Mele Nûrî Hesarî

Mele Nûrî Mele Yûsif: Di sala 1934'an de li gundê Hisarî ji dayik bûye, li çend herêman perwerdehiya xwe wergirtiye û paşê li bajarê Qamişlo bi cih bûye.

## Xebatên wî yên yên wêjeyî û nivîsên wê

Ew oldar bû ku rêya xêrê nîşanî mirovan dida, herwiha helbestvan bû û helbestên xweş dinivîsand. Wî ji zimanê Kurdî hez dikir, helbest li ser welat, lehengî, wêrekî û azadiyê nivîsandin û berhevokek helbestan çêkir.
Di sala 2011'an de li bajarê Qamişlo koça dawî kir, piştî ku zanîn, helbest û bîranîneke xweş ji me re hişt.

# الشاعرُ الكرديُّ ملا نوري هساري

مَلَّا نوري مَلَّا يوسف: وُلد عام 1934 في قريةِ هساري، وأخذَ تعليمَه في مناطقَ عديدةٍ، واستقرَّ لاحقًا في مدينةِ قامشلو.

## نشاطُهُ الأدبيُّ وكتاباتُه

كانَ رجلَ دينٍ، يعلّمُ النَّاسَ طُرقَ الخَيرِ، وشاعرًا يكتبُ قصائدَ جَميلةٍ، وهُوَ يحبُّ اللُّغَةَ الكُرْدِيَّةَ، فكتبَ قصائدَ شِعريةً عنِ الوَطنِ والبُطُولةِ، وعنِ الشَّجاعَةِ، والحرِّيَّةِ، وألّفَ ديوانَ شعرٍ. توفي عامَ 2011 في مدينةِ قامشلو بعدَ أنْ تركَ لنا علمًا وشعرًا وذكرى جميلةً.



# Hin navên bi tîpa – ç

Çiya
Çiyajîn
Çiyager
Çinar
Çavşîn
Çekdar
Çavrê

Hevalên hêja, bi destpêka Adarê re bihar dest pê dike û ew demek guncaw e ji bo çandina dar û Şînatiyên ku alîkariya paqijkirina hewayê dikin. Em dikarin bermahiyên xwarinê li mal kom bikin da ku bibe semadeke xwezayî ji Şînatiyan re.

Dan û bermahiyên nan di nav daran, li ser banên xaniyan û di baxçeyê malê de belav bikin, da ku çûkên koçber ên piçûk wê bixwin û hûn bi wan re bibin heval û ji wan fêrî awazên xweŞ bibin.

أصدقائِي الأعزاءَ، مع بدايةِ آذارَ يبدأُ الرَّبيعُ، وهو وقتٌ مناسبٌ لزراعةِ الأشجارِ، والنَّباتاتِ الصَّغيرةِ. الَّتي تساعدُ في تنظيفِ الهَواءِ، وتُلطِّف الجوَّ. ويمكنُنا جمعُ بقايا الطَّعامِ العُضوي في البيتِ؛ ليكونَ سمادًا طبيعيًّا للنَّباتاتِ.

انثُروا الحَبَّ، وبقايَا الخُبزِ بينَ الأشجارِ، وعلى سُطوحِ المنازلِ، وفي حديقةِ المنزلِ؛ لتأكلَه الطُّيورُ الصَّغيرةُ المهاجِرَةُ، ولتكونُوا أصدقاءَ لهَا، وتتعلَّمُوا منْها فنَّ التَّغريدِ الجَميلِ.



# Pirs û bersivên xweş bi hevalên me yên piçûk re

# أسئلةٌ وأجوبةٌ مُمتعَةٌ مع أصدقائِنا الصِّغارِ

Gwer lawirekî te hebe û biaxive, ew ê çi pirsê ji te bike?
-Wê pirsa navê min û xwarin ku dixwe, bike

- إذا كان لحيوانكِ الأليفِ صوتٌ يتكلّم، ماذا يسألُكِ؟
- يسألُني عن اسمي، ثمَّ عنِ الطَّعامِ، الذي يأكلُهُ.

**Hêlîn Selman Dirbas- 12 salî**

**هيلين سلمان درباس. 12 سنة**



-Eger tu li gencîneyeke windabûyî bigere, tu dê li ku derê bigere?
-Li Rojava, ji ber ku di bin axa wê de şûnewar û dîroka welatê me ya xweş heye.

- لو بحثتِ عن كنزٍ مفقودٍ، فأينَ تبحثينَ؟
- في روج آفا، فَتحتَ أرضِها آثارُ الأجدادِ وتاريخُ بلادنِا الجميلُ.

**Jiyan Salih Şêxmûs- 12 salî**

**جيان صالح شيخموس. 12 سنة**




Pandayê rageş
Silav hevalno! Hûn dizanin çima li dora çavên min xalên reş hene?
Hmm… Belkî ji ber xewa zêde ye?
Min te bihîst, hahaha! Na, hevalê min, ev îmzeya min e ku min bêhempa dike.


Ez her roj dara xêzeran dixwim… Ma hûn dizanin çiqas pêdiviya min bi wê heye? Rojane zêdeyî 12 kg
Waw! Ji ya ku em hemû di hefteyekê de dixwin zêdetire!
Hahaha....
Mala min li çiyayên Çînê ye… Li cihê ku mij û berf daristanê sar û xweş dikin.
Hevalê me panda yê şermok, em îro wî li nêzîkî xwe dibînin, wekî her carê dilîze.


Panda, çima tu jî wek me koç nakî?
Ji ber ku ez li vir bextewariyê dibînim, xêzeran û aramî heye.


Pandayek rastîn! Çiqas delal e!
Silav hevalên min ên biçûk… Ma hûn dixwazin sirê bextewariya min nas bikin?


Erê! ka ji me re bêje
sir ew e ku ez ji her kesê ku li vê daristanê bi min re dijî hez dikim û em hemû hevkariyê dikin da ku jîngeha me paqij bimîne.
Bi xatirê we hevalên min! Ji bîr mekin… Her kesê ku ji xwe hez dike, di dilê xwe û dilê yên din de bextewariyê diçîne.



**Şêr**

أَسَدٌ

**Lion**



**Meymûn**

قِرْدٌ

**Monkey**



**Kiwala**

كُوَالَا

**Koala**



**Jûjî**

قُنْفُذٌ

**Hedgehog**




# Çavika Mizgîn

عدسة مزكين

العدد - 202

مجاناً

# مزكين

1-آذار- 2026

